Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

Euroopan unionin osarahoittama

# Hevpeyivîna Penaberiyê

**Hûn ji bo hevpeyivîna Saziya Koçberiyê hatine vexwendin. Vê rêberiyê, ya ku behsa maf û erkên we yên di hevpeyivînê de dike, bi baldarî bixwînin. Ger pirsên we di derbarê vê rêberiyê de hebin, hûn dikarin di destpêka hevpeyivînê de pirsên xwe ji karmendê Saziya Koçberiyê re bişînin.**

## Mebesta hevpeyivîna penaberiyê çi ye?

- Hevpeyivîna penaberiyê, rûniştineke fermî ye ku bi karmendekî Saziya Koçberiyê re tê organîzekirin û tê de divê tu bi hûrgulî behsa wan sedeman bikî ku tu ji ber wan li Fînlendayê daxwaza parastina navneteweyî dikî û ji ber wan tu nikarî vegerî welatê xwe.

- Di hevpeyivînê de tenê serlêdana parastina navneteweyî tê nirxandin. Ger endamên malbata te li Fînlendayê hebin, tu dikarî li ser bingeha girêdana malbatî daxwaza destûra rûniştinê bikî. Ji bo vê, divê tu serlêdaneke cuda û bi pere ya destûra rûniştinê bikî.



## Li ku derê, kîjan demê û bi çi awayî hevpeyivîn tê organîzekirin?

- Te bi vê rêberiyê re vexwendnameyeke hevpeyivînê standiye. Di wê vexwendnamê de hatîye diyarkirin ka dê hevpeyivîna we li ku derê, kîjan demê û bi çi awayî were organîzekirin.
- Hevpeyivîn tê qeydkirin (deng tê girtin) û ger tu bixwazî, tu dikarî daxwaza nusxeyeke qeydê ji bo xwe bikî. Qeydkirin ji bo ronîkirina nezelaliyên muhtemel tê kirin û Saziya Koçberiyê wê bi kesên ji derve re parve nake.
- Di odeya hevpeyivînê de dibe ku kamerayeke ewlehiyê ya ku dîmenan qeyd dike hebe.
- Ji bo hevpeyivînê girutanek (raportek) tê amadekirin.
- Her tiştê ku tu di hevpeyivînê de dibêjî nehênî ye (sir e). Tiştên ku te gotine ji derve re nayên parvekirin, ji bilî wan rayedarên peywendîdar ên ku ji bo birêvebirina dozê hewce ne û mafê wan ê qanûnî yê bidestxistina agahiyan heye.
- Ger hevpeyivîna te bi rêya vîdyoyê (onlayn) were organîzekirin, ev yek di vexwendnamê de tê diyarkirin. Tu dikarî agahiyên zêdetir di derbarê rûniştinên bi rêya vîdyoyê de li ser malpera Saziya Koçberiyê **migri.fi/turvapaikanhakijan-asiointi** bibînî.
- Tu nikarî bê sedemek maqûl (bingehîn) wextê hevpeyivînê biguherînî. Ger tu di roja hevpeyivînê de nexweş bikevî, tavilê agahiyê bide Saziya Koçberiyê. Tu dikarî di vê mijarê de, gava hewce bike, ji navenda pêşwazîkirinê (kampê) alîkariyê bistînî. Divê tu sedema

maqûl agahdar bikî an jî di zûtirîn dem de, an herî dereng di nava hefteyekê de piştî roja hevpeyivînê, raporta nexweşiyê ya ji perestara navenda pêşwazîkirinê an jî ji bijîşkî ji Saziya Koçberiyê re bişînî. Ger tu bê sedemek maqûl tevlî hevpeyivîna penaberiyê nebî, dê wisa were hesibandin ku te serlêdana xwe bi awayekî nerasterast betal kiriye û dê pêvajoya çareserkirina dozê were girtin.

## Kî di hevpeyivînê de amade ne?

Tenê ew kesên ku hatine vexwendin û kesên din ên ku ji berê de ligel Saziya Koçberiyê li ser wan lihevkirin çêbûye, dikarin wergî hevpeyivînê. Di hevpeyivînê de karmendê Saziya Koçberiyê (yanî hevpeyivîner) amade dibe, û li gorî rewşê wergêr, parêzer (alîkarê qanûnî), nûner, welî/parêzger (edunvalvoja) an kesê piştgir amade dibin; ger te daxwaza kesekî piştgir ji bo hevpeyivînê kiribe û wî kesî destûr ji Saziya Koçberiyê standibe ku tevlî bibe. Tu dikarî agahiyên berfirehtir li ser rola beşdaran li ser malpera Saziya Koçberiyê **migri.fi/turvapaikanhakijan-asiointi** bixwînî.

## Kîjan mafên min di hevpeyivînê de hene?

- Mafê te heye ku tu di hevpeyivînê de parêzerekî (alîkarekî qanûnî) bi kar bînî. Parêzer li gorî biryara xwe tevlî hevpeyivînê dibe. Ger tu penaberekî mezin (gihîştî) bî, divê tu bi xwe parêzerekî peyda bikî. Ger tu parêzerekî ji bo hevpeyivînê peyda nekî jî, em ê hevpeyivînê bêyî parêzer çêbikin.

- Ger tu zarokekî piçûk (bênûner) bî ku bêyî welî yî, nûnerê te her dem di hevpeyivînê de amade dibe. Nûnerê te, gava pêwîst be, berpirsiyar e ku parêzerekî ji bo hevpeyivînê peyda bike. Ger nûnerê te tune be, weliyê te yê ku li Fînlendayê ye di hevpeyivînê de amade dibe.

- Di hevpeyivînê de wergêrek amade dibe. Erka wergêr ev e ku her tiştê ku di hevpeyivînê de tê gotin bi awayekî bêalî werdigerîne. Wergêr an li cihê hevpeyivînê amade dibe, an jî dikare bi rêya telefonê an vîdyoyê wergêraniyê bike.

- Ger sedemeke te ya maqûl hebe ku tu bixwazî wergêr an hevpeyivîner jin an mêr be, vê yekê pir beriya hevpeyivînê ji karmendê navenda pêşwazîkirinê (kampê) re bibêje. Navenda pêşwazîkirinê daxwaza te ji Saziya Koçberiyê re dişîne. Saziya Koçberiyê dinirxîne ka sedem maqûl e an na. Ger tu di yekîneya girtîgehê (samilandinê) de an di saziyeke din de bî, vê yekê ji karmendê cihê rûniştina xwe re bibêje. Ger tu zarokekî piçûk î ku bêyî welî yî, ji nûnerê xwe alîkariyê bixwaze.

- Hevpeyivîner û kesên din ên ku di hevpeyivînê de amade ne, erkê wan ê parastina nehêniyê (sirparêziyê) heye, yanî ew nikarin tiştên ku di hevpeyivînê de dibîzin ji tu kesekî ji derve re bibêjin. Lê belê, ew tiştên ku tu di hevpeyivînê de dibêjî, dikarin bandorê li ser pêvajoya serlêdana endamên malbata te bikin. Di rewşên wisa de, em ê wan di doza endamê malbata te de li ber çavan bigirin. Herwiha, ger eşkerebûna wan tiştan bibe sedema metirsî an zirarê ji bo te an ji bo kesekî nêzîkî te, em dikarin wan tiştên ku te gotine ji endamên malbata te veşêrin. Tu dikarî di hevpeyivînê de nêrîna xwe ya li ser vê mijarê bibêjî.
- Belgeyên der barê te de bi bingehîn nehênî ne. Ger tu zarokekî piçûk bî ku bêyî welî yî, Saziya Koçberiyê dikare li dê û bavê te an weliyê te yê rasteqîn bigere (şopa wan bibe). Bi weliyê rasteqîn re ew kes tê fêmkirin ku li welatê te miqateyî te bûye (li te nêriye). Ji bo şopandinê tenê ew agahiyên ku ji bo şopandinê hewce ne têne bikar bînin. Saziya Koçberiyê şopandinê bi awayekî wisa dike ku tu zirar an metirsî negihîje te an kesên nêzîkî te. Saziya Koçberiyê di hevpeyivînê de dê nêrîna te ya li ser şopandinê û herwiha agahiyên ku dikarin di şopandinê de bibin alîkar ji te bipirse.

## Kîjan erk û berpirsiyariyên min di hevpeyivînê de hene?

- Olet velvollinen tekemään yhteistyötä ja kertomaan totuuden.
- Sinulla on velvollisuus kertoa ja antaa selvityksiä kaikista niistä syistä, miksi olet hakenut kansainvälistä suojelua. Vastaa kysymyksiin niin tarkasti kuin pystyt.
    - Jos kieltäydyt vastaamasta kysymyksiin ilman perusteltua syytä, eikä tästä syystä puhuttelussa saada riittävästi tietoa turvapaikkaperusteistasi, hakemuksesi katsotaan epäsuorasti peruutetuksi ja asian käsittely päätetään.
- Jos et kerro totuutta, se voi vaikuttaa kielteisesti hakemukseesi. Kerro totuus ja älä jätä kertomatta mitään tietoja, mitkä ovat olennaisia hakemuksesi kannalta.
- Huomioi, että väärien tietojen antaminen tai oikeiden tietojen salaaminen voi myöhemmin johtaa jo myönnetyn luvan peruuttamiseen ja vaikeuttaa muiden asioidesi käsittelyä.
- Puhuttelija auttaa ja ohjaa sinua kertomaan perusteistasi kysymällä kysymyksiä. Tähän lukeutuvat myös mahdolliset arkaluontoiset ja vaikeat asiat. On oman etusi mukaista kertoa myös vaikeista asioista. Niillä voi olla ratkaiseva merkitys hakemuksesi kannalta.
    - Jos sinun on vaikea puhua joistain asioista, voit mainita siitä puhuttelijalle. On tärkeää, että kerrot kaikista hakemukseesi liittyvistä asioista, koska päätös tulee perustumaan puhuttelussa antamiisi tietoihin
- Jos puhuttelija havaitsee epäselvyyksiä tai ristiriitoja kertomuksessasi, sinulle annetaan mahdollisuus selvittää asiaa.
- Henkilötietojasi tarkastetaan puhuttelussa. Henkilötiedot perustuvat ensisijaisesti asiakirjoihin. Jos haluat puhuttelun jälkeen muuttaa henkilötietojasi, tarvitset sitä varten passin tai muun virallisen henkilöllisyystodistuksen.

- Maahanmuuttovirasto tallentaa henkilötietosi ja hakemusperusteesi ulkomaalaisasioiden asiankäsittelyjärjestelmään, joka on viranomaisrekisteri.
- Väärien henkilötietojen antaminen viranomaiselle tai väärän tiedon antaminen merkittäväksi viranomaisrekisteriin on rikos, josta seuraa rangaistus. Suomessa rikosvastuu koskee 15 vuotta täyttäneitä.

## Ez çawa dikarim xwe ji bo hevpeyivînê amade bikim?

- Di hevpeyivînê de divê tu sedemên serlêdana xwe ya parastina navneteweyî bi gotinên xwe bibêjî. Tu dikarî xwe ji bo hevpeyivînê amade bikî bi nivîsandina dîrok û navên girîng. Gava tu ji berê de xwe amade bikî, dê ji bo te hêsantir be ku tu di hevpeyivînê de behsa ezmûnên (serboriyên) xwe bikî.
- Hemû ew belgeyên peywendîdar ên serlêdana xwe ku te hîna radestî Saziya Koçberiyê nekirine, bi xwe re bîne hevpeyivînê. Xwe amade bike ku bi kurtî bibêjî ka ev belge çawa bi sedemên te yên penaberiyê re têkildar in. Ev belge dikarin bibin wek mînak: nasname, belgeyên din ên fermî, raporên bijîşkî, herwiha gotarên rojnameyan û weşanên ku bi çîroka te re têkildar in. Belge ji ber vê yekê jî girîng in ku di çarçoveya serlêdana te ya parastina navneteweyî de, tê nirxandin ka sedemên te ji bo destûreke din a rûniştinê hene an na, wek mînak ji ber sedemên mirovî yên kesane.
- Berî hevpeyivînê, li hemû rêberî û broşûrên ku te ji rayedaran standine binêre.

## Di hevpeyivînê de çi diqewime?

- Di destpêkê de, hevpeyivîner rave dike ka dê di hevpeyivînê de çi bibe. Hevpeyivîner piştrast dike ku te maf û erkên xwe yên ku di vê rêberiyê de hatine rêzkirin fêm kirine. Gava hewce bike, hevpeyivîner maf û erkan ji te re rave dike. Ger tu di tiştekî fêm nekî, bipirse.
- Hevpeyivîner dipirse ka tu û wergêr ji hev fêm dikin an na. Ger tu ji wergêr fêm nekî, bêje.
- Hevpeyivîner kontrol dike ka di rewşa te ya tenduristiyê de guhertin çêbûne an na. Piştî vê yekê, hevpeyivîner agahiyên te yên kesane dinirxîne û dikare di derbarê paşxaneya te de pirsan ji te bike.



- Rêbernameyên ku ji aliyê hevpeyivîner ve tên dayîn, bi baldarî guhdar bike.
- Paşê, tê ronîkirin ka çima tu neçar mayî ku ji welatê xwe birevî û çima tu nikarî vegerî wir. Hevpeyivîner te han dide ku tu bi awayekî azad û bi hûrgulî behsa wan sedeman bikî ku tu ji ber wan daxwaza parastina navneteweyî dikî. Herwiha hevpeyivîner li gorî hewceyê te ber bi wan mijaran ve rênîşandî dike ku ji bo serlêdana te girîng û bingehîn in.
- Gava te sedemên serlêdana xwe gotin, hevpeyivîner pirsên zelalkirinê ji te dipirse da ku mijarên bingehîn werin ronîkirin. Hevpeyivîner dikare ji te pirsên hûrgulî di derbarê cihê rûniştina te ya li welêt an mijarên din ên ku di birêvebirina doza te de giring in, bipirse.

- Ger tu di pirsekê fêm nekî, vê yekê ji hevpeyivîner re bêje. Hevpeyivîner dê pirsê ji te re zelal bike.
- Dema hevpeyivînê diguhere. Tu dikarî di her qonaxa hevpeyivînê de daxwaza navbirekê (bêhnvedanê) bikî.
- Saziya Koçberiyê dikare di hevpeyivînê de nêrîna te li ser wan lêkolîn an raportan bigire ku dikarin bandorê li ser biryara doza te bikin. Wek mînak, ger tu li Fînlendayê bi gunehekî (sûcekî) hatibî tawanbar kirin an li Fînlendayê hatibî mehkûm kirin, ev yek dikare bandorê li ser birêvebirina dozê li Saziya Koçberiyê bike. Saziya Koçberiyê, gava hewce bike, di hevpeyivînê de derfetê dide te ku tu nêrîna xwe di vê mijarê de bibêjî.
- Ji bo hevpeyivînê girutanek tê amadekirin. Hevpeyivîner girutanê bi te re bi awayekî tam an beşek ji wê kontrol dike, ger Saziya Koçberiyê vê kontrolê hewce bibîne. Ger hevpeyivîner di dema hevpeyivînê de girutanê bi tevahî bi te re kontrol neke, dê wextekî diyarkirî ji te re were dayîn ku tu heta wê demê dikarî zêdekirin û rastkirinan ji girutanê re bişînî. Tu ê nusxeyekê ji girutanê ji bo xwe bistînî.
- Di dawiya hevpeyivînê de, tu ê rêberiyekê bistînî ku di lînkên wê de agahiyên zêdetir hene, wek mînak di derbarê şandina belge û daxuyaniyan ji Saziya Koçberiyê re û herwiha di derbarê vegera dildarî ya bo welat. Tu dikarî bi rêya van kodên QR jî bighîjî lînkan:

**migri.fi/turvapaikkahakemuksen-kasittely**

**voluntaryreturn.fi/etusivu**

- Gelek girîng e ku tu hemû sedemên serlêdana xwe di hevpeyivînê de bibêjî. Ger piştî hevpeyivînê sedemên nû ji bo te çêbibin an tu bixwazî agahiyên nû bidî ser sedemên xwe yên berê, tavilê vê yekê ji Saziya Koçberiyê re an ji dadgeha ku li îtîraza te dinêre re ragihîne.

## Kîjan gav piştî hevpeyivînê tên avêtin ?

- Tê hewldan ku hevpeyivîn di dema ku jê re hatîye veqetandin de were qedandin. Ger hevpeyivîn nîvco bimîne, dê di rojeke din de were domandin. Di vê rewşê de, tu ê vexwendnameyeke nû ya hevpeyivînê bistînî.
- Tu dikarî daxuyanî û belgeyên zêdetir ên girêdayî serlêdana xwe bişînî, her dem heta wê dema ku biryar li ser serlêdana te were dayîn. Lê bala xwe bidê, ew agahiyên zêdetir ên ku piştî dema diyarkirî (muhletê) werin radestkirin, dibe ku di biryarê de li ber çavan neyên girtin. Belgeyên zêdetir bi awayekî nivîskî radest bike.
- Saziya Koçberiyê dê serlêdana te binirxîne û biryarê bide ka parastina navneteweyî dikare ji te re were dayîn an na, yan jî mafê destûra rûniştinê li ser bingeheke din dikare were dayîn, wek mînak ji ber sedemên mirovî yên kesane an jî ji ber ku tu bûyî qurbaniyê qaçaxçîtiya mirovan.

- Saziya Koçberiyê biryara doza te li ser bingeha wan agahiyên ku te di hevpeyivînê de dane, materyalên din ên ku hatine pêşkêşkirin û li ser agahiyên der barê welatê te de dide. Saziya Koçberiyê herwiha dikare ji bo biryarê, agahiyên girîng û bingehîn ji çavkaniyên giştî jî bigere û peyda bike.
- Saziya Koçberiyê dikare gava hewce bike, lêkolînan li ser rastbûna (orjînalbûna) belgeyên te li welatê te bike. Rayedarên welatê te dê bi vê yekê nehesin (zanibin) û ev lêkolîn nabe sedema tu metirsî an zirarê ji bo te an ji bo kesên nêzîkî te.
- Ger serlêdana te were redkirin, tu dikarî werî dersînorkirin (vegerandin) û qedexeya ketina nav axa Fînlendayê û welatên din ên peymana Schengenê li ser te were danîn.
- Mafê te heye ku tu di her qonaxa pêvajoya penaberiyê de daxwaza vegera dildarî ya bi alîkarî bo welatê xwe bikî. Ger serlêdana te were redkirin an tu serlêdana xwe ya parastina navneteweyî betal bikî, mafê te heye ku tu ji bo vegera dildarî daxwaza piştgiriyê bikî. Ji bo dayîna vê piştgiriyê hin şert hene û gava tu serlêdana piştgiriyê bikî, ew şert tên kontrolkirin. Ji navenda xwe ya pêşwazîkirinê (kampê) şîretan bixwaze an jî ji bo agahiyên zêdetir û agahiyên peywendiyê, li beşa şêwirmendiya vegerê ya Saziya Koçberiyê li ser malperê binêre:

  **migri.fi/paluu** an jî **voluntaryreturn.fi/etusivu**

- Ger tu bixwazî li dijî biryarê îtîraz bikî (gilî bikî), tu dikarî rêbernameyên têkildarî îtîrazê di pêveka biryarê de peyda bikî.
- Ger te tevî hevjîna/hevjînê xwe, zarokên xwe yên piçûk an mezinên di bin xwedîkirina te de daxwaza parastina navneteweyî kiribe, hûn ê bi giştî biryareke hevpar bistînin; hertişt hebe ku Saziya Koçberiyê pê ranebe ku ji bo doza we çêkirina biryarên cuda maqûl e. Hevpeyivîner dê di hevpeyivînê de ji te bipirse ka sedemên te hene ku tu ji ber wan bixwazî biryarên cuda werin dayîn an na.
- Ger paşê sedemên nû yên penaberiyê ji bo te çêbibin, tavilê wan ji Saziya Koçberiyê re an ji dadgeha ku li îtîraza te dinêre re ragihîne. Ger tu van hûrgulî an sedemên nû tavilê gava ku derfeta te hebe neynî ziman, mimkun e ku ew neyên lêkolînkirin heger tu li ser bingeha wan serlêdaneke din a paşerojê bikî.